
# Rojek jibo....hin fikr û îde jibo çalakiyên hevpar jibo dêbav û zarokan


Dêbav û zarokên delal

Li jêrê hûn fikr û îdeyên xwe derbarê hînbûn, keşfkirin û lîstinê jibo her rojê dibînin. Ev fikr û îde alîkariya we jibo xurtkirina xwe, amadebûn jibo dibistanê û hebûna dem û gavine baş li kêleka hevdu dikin.



**Rojek jibo lîstikên komî**


Lîstikên bi kart an belgeyan an li ser maseyê cih bînin. Kişik (Şetrenc). Bîr (Memory). Bîngo (Bingo). Domîno (Domino). Uno. Karêtn lîstinê û Tasa taybetî xwe bi kaxezê çê bikin. Rêzikên xwe yêln taybet eyar bikin.



**Rojek jibo plandarêştin û Şêwekariyê**


Hertim her tiştê ku dixwazî dîzayn bike an biresimîne. An derbarê mijareke taybet da şêwekarî bike. Amûrên cûrbecûr jibo nîgarekişandinê bi kar bîne: Pênivîsa Rengî, Majîk, Avren g, Gec (Jîps), Re n gên xwezayî pêkhatî ji gul û giyayayn.

Save the Children




**Rojek jibo lêgerîna li hawîrdorê**

Bimeşe û digel derdora xwe nasyar bibe. Mal, kolan, Park, cihên lîstinê û dûkanan di derdora xwe da bibîne. Heta radeya pêkan gelek mekanên ku zarok jê hez dikin bibîne.



**Rojek jibo Çîrok û Efsaneyan**


Çîrok, destan û efsaneyên welatê xwe jibo zarokan bibêje. Hewil bide ku çîrokan heta asta pêkan bi awayekî balkêş û bicoş bibêjî. Bihêle bila zarok çîroka ku jê hez dike bibêje.



**Rojek jibo livdarî û sporê**


Hevrê digel zarokan werzişekê ku we amûrên pêwîst jibo pêkanîna wê hene, pêk bîne. Wek mînak: Bezîn. Avjenîkirin. Fûtbal (Pêgog – Topa Pê). Walîbal. Tenîsa Ser Maseyê. Duçerxesiwarî. Reqa.

Save the Children




**Rojekê jibo mûzîk, stran û reqsê**

Li mûzîkê guhdarî bike. Sitranekê bixwîne. Reqseke kevn a welatê xwe nîşanî zarokê xwe bide.



**Rojek jibo kêfxweşkirina kesên din**


Îro li kêleka malbatê hevdu kêfxweş bikin. Hevdu ji nişkêva bi tiştekî baş sûrpirayz bikin. Ji malbata xwe bipirse ku bi çi tiştekî dikarî cara din wan sûrpirayz bikî.



**Rojek jibo parastina deb û rismeke welatê te bixwe**


Digel zarokan derbarê çanda gelê xwe û welatê xwe yê sereke, biaxive. Rêzgirtina li çanda xwe nîşanî zarokê xwe bide. Ji zarokê xwe ra şirove bike ku çand û deb û rism çiqasî girîng in.

Save the Children




**Rojek jibo temrînkirin û rahênana zimanê xwecihî**

Pênc hevokan bi zimanê xwecihî yê nû li welatê ku lê dijî, hîn bibe. Ji mezin an zarokên din bixwaze ku hin hevokan hînî te bikin.




**Rojek jibo Bîrkariyê**


Digel zarokê li ser Bîrkariyê biaxive. Çima Bîrkarî girîng e, di çi mewqiyan da mirov hewcetî bi Bîrkariyê heye. Rêzikên xwerû yên Bîrkariyê şirove bike.



**Rojek jibo cihanîna karekî hevrê digel malbatên din**


Bi malbateke din ra hevdîtinê pêk bîne û bi hev ra plan darêjin ku dixwazin bi hev ra çi karekî bikin. Ev malbat dikarin heta ew malbat bin ku bi zimanekî wekhev napeyivin.

Save the Children





**Rojek jibo lîstikên zimanî**

Digel zarokan lîstikên zimanî bi zimanê we bixwe an bi zimanekî biyanî pêk bîne. Li hin peyvan bigere ku bi tîpên wekhev û yeksan destpê dibin. An li hin peyvan bigere ku bi tîpa dawî ya peyva pêşîn destpê dibin. Peyvên (xeyalî) nû biafirîne, helbestên bi kêş û qafiye bixwîne.



**Rojek jibo temrînên leşî**


Hevrê digel zarokê xwe temrînên amadetiya leşî jibo tevahiya leşî cih bîne. Hereketên Rûne û Rabe. Hereketên Jora leşî. Hereketên avjenî li ser erdê. Hilkişiyan ji pilekanê. Leşê xwe bikişîne. Temrînên nû ji hev ra nîşan bidin.



**Rojek jibo Xeyîlînê**


Fikrên xwe derbarê tiştê ku hez dikin bi awayê xeyalîn bisêwirînin, parve bikin. We hez dikir bibin çi bûnewerek? We hez dikir çi hêzeke we ya ecêb hebe? Kîjan sûper-lehengên pirtûk, fîlm, çîrokên wêneyî (Komîk Strîp) an Çîrokan hez dikin?

Save the Children




## Rojek jibo hînbûna tiştekê derbarê zanistê

Derbarê zanistên ku ji wan hez dikî, biaxive. Çi tiştan mirov dikare di van zanistan da hîn bibe? Çi zanyarên nasyar hene? Çima ev zanist jibo mirovan girîng e? Mirov dikare kîjan zanistê di jiyana rojane da bi kar bîne?



## Rojek jibo hînbûna tiştekê derbarê welatê ku malbata te aniha li wir e


Jin kedkar an cînaran bipirse, li nav Înternetê bigere û derbarê xweza, gel, deb û rism, ziman, xwarek, spor an şikl û formên hunerê di welatê ku lê dimînî, lêzanînan bi dest bixe,



## Rojek jibo meşiyanê


Li nav parkekê, daristanekê, li kêleka çemek an golekê bimeşe an bigere. Ji mezinan bipirse ku mekanên wiha li derdora te li ku ne û çawa dikarî herî wan deran.

Save the Children




## Rojek jibo avakirinan

Bi hev ra Bircekê an şiklên din bi bikaranîna Kart, Pakêt, Pênivîs an tiştên din çêbikin. Hewil bidin ku avahiyê heta asta pêkan bi awayê bilind û xurt çêbikin.



## Rojek jibo serpêhatiyên malbatê

Derbarê serpêhatiyên pêkenî û balkêş di jiyan û malbata xwe biaxivin. Bîne bîra xwe ku te di wê demê da çi hestek hebû. Jibo zarokan bibêje kun bav û kalên te çawa dijiyan. Ji gotina çîrokên pêkenî jibo kesên din hez bike.



## Rojek jibo hînbûna tiştekê derbarê xwezayê

Digel zarokên xwe li ser vê yekê biaxive ku ewna hez dikin derbarê çi tiştekî pirtir bizanin: Derbarê mriovan, Giyayan, Canliberan, Diyardeyên xwezayî, Bûnayetî…fikrekê peyda bike ku çawa dikarî tiştkî di vî warî da hînî zarokan bikî (Pirtûk, Înternet, Serpêhatî, Gerr…)

Copyright: Save the Children Switzerland; based on: CIP Centar za interaktivnu pedagogiju & Save the Children International Serbia - Parenting on the Move.